



Schweizerische Eidgenossenschaft  
Confédération suisse  
Confederazione Svizzera  
Confederaziun svizra

Eidgenössisches Justiz- und Polizeidepartement EJPD  
Département fédéral de justice et police DFJP  
Dipartimento federale di giustizia e polizia DFGP  
Staatssekretariat für Migration SEM  
Secrétariat d'Etat aux migrations SEM  
Segreteria di Stato della migrazione SEM

## Kurtezanyarî

**B**

Penaberên pesendkirî

— Nasname B

**F**

Penaberên demane wergirtî

— Nasname F

**F**

Kesên demane wergirtî

— Nasname F



## **Bi xêr hatine Swîsê!**

We li Swîsê penaberî wergirtiye yan bi awayekî demane hatine pejirandin. Rewşa we girêdayî rêzikên taybet e. Em ê di vê broşûrê de ser vêya we agahdar bikin.

Hûn ê êdî bo demeke dirêj li Swîsê bijîn. Lewma girîng e hûn rêya xwe ya dorberê peyda bikin û di zûtirîn dem de bikevin nava jiyânê. Ev tiştên wekî vê ye ku hûn ji maf û erkên xwe agahdar bin û bo kar û perwerdeyê hewl bidin. Hûn ê di vê broşûrê de agahiyên bingehîn ser rêzikên taybet ku bo rewşa we bi kar tên herwiha girêdankên bo navnîşan û agahiyên zêdetir peyda bikin.

Fermangeha çapkariyê dewletê a ji bo penaberiya SEM

**Ev broşûr bi awaya elektronîk li [www.sem.admin.ch/info-integration](http://www.sem.admin.ch/info-integration) bi van zimanan heye:**

**Almanî, Fransî, Îtaliyayî, Inglîzî, Erebi, Tigrîniyayî, Kurdî, Tibetî, Farisî, Tamîlî, Somaliyayî û Sêrbî/Krwatî/Bonsniyayî**

**[www.sem.admin.ch/info-integration](http://www.sem.admin.ch/info-integration)**

# Kurtezaniyarî

## Naverok

---

**B**

Penaberên pesendkirî  
— Nasname B

---

**F**

Penaberên demane wergirtî  
— Nasname F

---

**F**

Kesên demane wergirtî  
— Nasname F

## Penaberê pesendkirî — Nasname B

**B** Penaber kesek e ku, ji ber nijad, dîn, netewe, girêdana bi komeke taybet a civakî yan nêrînên xwe yên siyasî, ketiye ber nebaşiyên yan tirsên wî/wê ya bingehn heyê ku li mal an welatê xwe bikeve ber van nebaşiyên. Ev ravekirin ser bingeha Konvansiyonên Têkildarî Rewşa Penaberan (Konvansiyona Penaberan a Jênêvê). Nebaşiyên cidî, bitaybet, gefa ser jiyane, hebûna bedenî yan azadî herwiha ew kiryar in ku zextên giran ên derûnî çêdikin. Hekarên taybet bo revîna jinan jî li ber çav tên girtin.

Konvansiyona Penaberan a Jênêvê jî dibêje divê tu kesî venegerînin welatê ku lê bikeve ber gefên jorê.

### Bingeha qanunî

Rewşa hiqûqî ji Konvansiyona Penaberan a Jênêvê tê. Li asta neteweyî, Peymana Penaberiyê (Madyên 58-62 yên Peymana Penaberiyê) serdest e.

Qanûna têkildar dikarin li vir peyda bikin:

[www.admin.ch/ch/d/sr/c142\\_31.html](http://www.admin.ch/ch/d/sr/c142_31.html)

### Nasnameya Bêgane

Penaberên pesendkirî dikarin destûra mayîne li wê kantonê wergerin ku bi awayê qanûnî lê dijîn (destûra B ya Welatîyên Biyanî). Ev bo salekê ye, lê bi gelemperî heya ku rêya pesendkirina wekî penaberiyê hebe tê dirêj kirin. Piştî ku penaberên pesendkirî 10 salan bi awayê qanûnî li Swîsê man, eger pîvanên tevlêbûnê pêk werin û rêya betalkirinê tunebe, destûra mayîna herdemî dikarin bidin wan (destûra C). Kesên ku bi hêsani tevlêbûnê dikin û dikarin bi zimanê cihê mayîna xwe baş pêwendiyên çêbikin dikarin piştî 5 sal mayîna qanûnî daxwaza destûra mayîna herdemî bikin.

# Penaberên hılanînê bi demî

## — Nasname F

F

Paneberê demane pejirandî kesek e ku xwedan mercên penaberiyê ye, lê penahî wernegirtiye ji ber ku bo derkirina ji penaberiyê delîl hene. Ev wê demê ye ku rewşa kesekî wekî penaber ev e ku tenê mal an welatê xwe ji ber reftara xwe ya piştî derketina ji welêt terikandiye. Ew penaberên ku rêya derketina wan a ji penaberiyê heye wekî demane tên pejirandin.

### Bingeha qanunî

Rewşa hiqûqî ya penaberên demane pejirandî ji Konvansiyona Penaberan a Jênevê tê. Bo pejirandina demkî Peymana Federal li bara Welatîyên Biyanî û Tevlêbûnê (AIG) (Madeyên 83-88a AIG) serdest e.

Qanûna têkildar dikarin li vir peyda bikin:

[www.admin.ch/ch/d/sr/c142\\_20.html](http://www.admin.ch/ch/d/sr/c142_20.html)

### Nasnameya Bêgane

Penaberên pesendkirî û kesên demane pejirandî destûra F werdigirin. Ev bo herî zêde diwazde mehan tê dayîn û kantona ciyê mayînê dikare 12 mehên din jî dirêj bike. Penaberên demane pejirandî û kesên demane pejirandî piştî mayîna qanûnî ya 5 salan li Swîsê dikarin daxwaza destûra mayînê (destûra B) bikin. Rayedar li dema lînerîna daxwazê li asta tevlêbûnê, têkiliyên malbatê û maqûlbûna vegera welêt dinêrin.

## Kesên demane wergirtî — Nasname F

F

Kesê demane hatiye pejirandin ew kes e ku daxwaza wî/wê ya penaberiyê hatiye redkirin lê ji ber delîlên jêrê derkirin an pakkirina navê wî/wê nikare pêk were: Pêkanîna pakkirina nav mimkin nîne (wek mînak, eger belgeyên seferê neyên bidestanîn), micaz nîne (eger pêkanîn binpêkirina naveroka hiqûqa navneteweyî be) yan maqûl nîne (wek mînak, ji ber şerr yan rewşeke tundiya giştî li welatê wî/wê).

### Bingeha qanunî

Bo rewşahiqûqî ya kesên demane pejirandî Peymana Federal li bara Welatîyên Biyanî û Tevlêbûnê (AIG) (Madeyên 83-88a AIG) serdest e.

Qanûna têkildar dikarin li vir peyda bikin:

[www.admin.ch/ch/d/sr/c142\\_20.html](http://www.admin.ch/ch/d/sr/c142_20.html)

### Nasnameya Bêgane

Penaberên pesendkirî û kesên demane pejirandî destûra F werdigirin. Ev bo herî zêde diwazde mehan tê dayîn û kantona ciyê mayîne dikare 12 mehên din jî dirêj bike. penaberên demane pejirandî û kesên demane pejirandî piştî mayîna qanunî ya 5 salan li Swîsê dikarin daxwaza destûra mayîne (destûra B) bikin. Rayedar li dema lînerîna daxwazê li asta tevlêbûnê, têkiliyên malbatê û maqûlbûna vegera welêt dinêrin.

## Rûniştin

B  
F  
F

Penaberên pesendkirî, penaberên demane pejirandî û kesên demane pejirandî li dema yan piştî kutabûna rêbaza penaberiyê li kantonekê diyar dibin. Ew ê heya ku biryar were dayîn li heman kantonê bimînin. Hûn dikarin bi dilê xwe diyar bikin li nava wê kantonê li ku bimînin. Kesên demane pejirandî ku sûdên rifaha civakî werdigirin dikarin ji aliyê rayedarên kantonê ve cihê mayîna wan diyar bibe. Destûra dayî bo welatîyên biyanî tenê li wê kantonê itibara wê heye ku bo diyar bûye.

**Agahiyên bifêde bo kirêkêşan bi 16 zimanan:**

**[www.bwo.admin.ch/bwo/de/home/wie-wir-wohnen/infoblatt-wohnen/infoblatt.html](http://www.bwo.admin.ch/bwo/de/home/wie-wir-wohnen/infoblatt-wohnen/infoblatt.html)**

**Swiss Tenants Association:**

**[www.mieterverband.ch](http://www.mieterverband.ch)**



## Guherandina kantonan

**B**

Penaberên pesendkirî dikarin bo guhertina kantonê daxwazê bidin rayedarên koçberiyê yê kantona ku hez dikin biçinê. Eger daxwazkar bo herdem girêdayî sûdên rifaha civakî nebe yan eger rêyên din ên betalkirinê li gorî qanûna koçberiyê tunebin, daxwaz bi gelemperî tê qebûlkin.

---

**F**

Penaberên demane pejirandî dikarin bo guhertina kantonê daxwaz bikin. Eger daxwazkar bo herdem girêdayî sûdên rifaha civakî nebe yan eger rêyên din ên betalkirinê li gorî qanûna koçberiyê tunebin, daxwaz bi gelemperî tê qebûlkin. Daxwaz guhertina kantonê divê rasterast li SEM were kirin.

---

**F**

Biyaniyên demane pejirandî dikarin daxwaza guhertina kantonê bikin. Daxwaz dibê werê redkirin, eger hew kese bêkar bê û yan jî sedemekî derewandinê hebê. Daxwaza guherandinê kantonê dibê yekser li cem SEM werê hildan. Eger daxwaz bo gihîştina malbatê be yan eger her du kanton ser daxwaza guhertina kantonê li hev bikin, daxwaz tê pesendkirin.

## Rêwîtiyê dervayî welêt

**B**  
**F**

Penaberên pesendkirî penaberên demane pejirandî dikarin daxwaza belgeya seferê bo penaberan li daîreya koçberiya kantonê lê dimînin bikin û dikarin pê wê li Swîsê û derve sefer bikin û vegerin. Bo vêya, hûn divê bixwe serdana daîreya koçberiyê bikin. SEM belgeya seferê dide û bi gelemperî jî bo pênc salan itibara wê heye.

**Girîng:** Belgeya seferê bo penaberan rê nade hûn biçin welatê xwe yan welatê jê hatine. Eger penaberê pesendkirî yan penaberê demane pejirandî sefera welatê xwe yan welatê jê hatiye bike, rewşa wî/wê ya penaberiyê dikare betal bibe.

Herwiha, divê ji bîr nebe ku belgeya seferê bo penaberan bi awayê xwebixwe rê nade hûn biçin welatên din. Ketina nava devera Şêngênê bo armancên geştyariyê bêyî vîza heya sê mehan mimkin e. Bo çûyîna welatên din, divê vîzaya we hebe. Ji kerema xwe bo vêya ji rayedarên wî welatî bipirsin ku hûn dixwazin biçinê.

**F**

Kesên demane pejirandî nikarin azadane sefera derve bikin. Hûn divê pasaporta xwe ya welatê jê hatine li bal SEM bihêlin. Bo mijarên maqûl (wek mînak, nexweşiyên giran yan mirina endamên malbatê), hûn divê bixwe serdana daîreya koçberiyê ya kantonê bikin û daxwaza vîzaya vegeerê bikin. Eger hûn nikarin ji welatê xwe yê jê hatine pasaportê wergirin, hûn dikarin daxwaza belgeya seferê bo biyaniyan bikin, ku dikarin pê sefer bikin. Ev belgeya seferê dikare tenê bo sefera erêbûyî be.

## Hanîna malbetê û penaberiya malbatê

**B**

Penaberên pesendkirî dikarin endamên malbata xwe (hevjin, çîrîkên tomarbûyî û zarokên jêrî 18 salî) bînin Swîsê. Ev endamên malbatê dê wekî penaberên pesendkirî werin nasîn û penaberiyê wergirin, bi mercê ku ev yekeya malbatî beriya revîna wan hebûbe û tu rewşeke taybet bo pêşgirtina vêya tunebe.

Her zaroka ku piştî pesendkirina rewşa wan a penaberiyê li Swîsê were dinyayê xwebixwe wekî penaber nayê naskirin. Bo vêya, girîng e ku daxwazeke penaberiyê di zûtirîn dem de piştî bûyîna zarokê li bal SEM were kirin bo ku rewşa penaberiyê bidin zarokê.

**F**  
**F**

Penaberên demane pejirandî û kesên demane pejirandî divê kêmanî 3 salan piştî pejirîna demane li bendê bin ku bo hevgehîştina malbatê daxwazekê bidin rayedarên koçberiyê yên kantonê. Tenê hevjin, çîrîkên tomarbûyî û zarokên jêrî 18 salî dikarin bi rêya hevgehîştina malbatê werin Swîsê. Pêşmercên hevgehîştina malbatê ew in ku malbat bi hev re bijîn, xaniyê wan bo hemû malbatê guncaw be, girêdayî sûdên civakî nebe û zimanê cîyê mayîne bizanin.

Eger pêwîstiyên têkildarî demeê bo hevgehîştina malbatê pêk werin, daxwaza hevgehîştina malbatê divê di nava 5 salên din de were dayîn. Daxwaza anîna zarokên ji 12 salî sertir divê di nava 12 mehên din de were dayîn.

## tevlêbûn

B  
F  
F

Ew kesên ku bo demên dirêjbûyî li Swîsê dijîn divê di zûtirîn demê de tevlêbûnê bikin. Bo vêya, girîng e ku hûn agahiyên berhev bikin û hewl bidin zimanê xwecihî hîn bibin, li dû peydakirina kar bin, bikevin nava jiyana civakî. Swîs bi rêya bername û projeyan piştevaniya pêvajoya tevlêbûnê dike û têdikoşe ku bo hemûyan derfetên wekhev pêşkêş bike. Armanca tevlêbûnê hevjiyana aştîyane ya kesên xwecih û ne xwecih e li ser bingeha nîrxên diyar li Destûra Federal herwiha rêzgirtin û tehemula duyalî be.

Agahiyên zêdetir li bara tevlêbûna li Swîsê:

[www.integrationsagenda.ch](http://www.integrationsagenda.ch)

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration.html)

## Alikariyê tevlêbûnê

B  
F  
F

Çendîn sazîyên dewletê û yê taybet ders û bernameyan bo piştevaniya penaberên pesendkirî, penaberên demane peji-randî, û kesên demane peji-randî li qonaxa tevlêbûnî li Swîsê pêşkêş dikin. Em we han didin li dû şêwirmendiyê bin û ji van xizmetan sûtê wergirin. Agahiyên pêwîst dikarin li daî-reyên kantonî yan yê tevlêbûnê taybet peyda bikin.

Zeniyariyên zêdetir li ser Palpiştîyên tevlêbûnê:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration/foerderung.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration/foerderung.html)

Xalên pêwendiyê bo tevlêbûnê li kantona û bajarên:

[www.sem.admin.ch/sem/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale\\_behoerden/kantonale\\_ansprechstellen.html](http://www.sem.admin.ch/sem/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/kantonale_ansprechstellen.html)

Agahiyên li bara bernameyên tevlêbûnê yê kantonê (KIP):

[www.kip-pic.ch/de/](http://www.kip-pic.ch/de/)

## Dibistan û perwerde

B  
F  
F

Penaberên pesendkirî, penaberên demane pejiwandî û kesên demane pejiwandî divê wekî hemû zarokên din li Swîsê biçin dibistanê. Perwerdeya neçarî, zarokistan jî tê de, yazdeh salan dikişîne û li 4 saletiyê dest pê dike. Piştî wê, zarok li gorî şiyana xwe dikarin rahênan û perwerdeya karî kuta bikin (VET), yan biçin dibistana navgîn û piştê jî zanîngehê.

Agahiyên zêdetir li bara perwerdeya neçarî û VET:  
[www.ch.ch/private/00060/00062/index.html?lang=de](http://www.ch.ch/private/00060/00062/index.html?lang=de)  
[www.berufsbildung.ch](http://www.berufsbildung.ch)

## Perwerdeyê zêdetir

B  
F  
F

Li bazara kar a Swîsê, karkar divê pêwîstiyên xurt ên şareza-bûna zimanî û şiyanên teknîkî bizanin. Pircaran, mercên biyaniyan têra bazara kar a Swîsê nakin yan şiyanên ji derve li vir nayên qebûl kirin. Kursên zimên, domandina perwerdeyê yan xizmetên din divê arîkariyê bidin we xwe bigihînin dinyaya kar. Navendên Têkildar ên Tevlêbûnê û navendên şewirmendiya karê kantonî dê agahî û şewirmendiyên pêwîst bidin we.

Herwiha hûn dikarin bi daîreya şewirmendiya kar û rahênan û perwerdeyê li kantona ciyê jiyana xwe re pêwendiyê çêbikin:  
[www.berufsberatung.ch/dyn/show/8242](http://www.berufsberatung.ch/dyn/show/8242)

## Kar

B  
F  
F

Kar û sexwebûna aborî hêmanên girîng bo tevlêbûna li civakê ne. Ji xizmetên ku rê ji we re hêsan dikin bikevin nava dinyaya kar sûdê wergirin û bihêlin rayedarên têkildar şê-wirmendiyê bidin we. Hûn divê bi awayekî çalak li dû kar bin.

Hûn dikarin li seranserê Swîsê karekî baş peyda bikin. Li gorî hin mercan, derveyî kantona xwe mayîna we bi qasî heft-eyekî mimkin nîne. Berpîrsê kar divê beriya destpêkirina karê we rayedarê têkildar ê kantonê ji cihê kar agahdar bike.

Herwiha kutabûn û guhertina kar jî divê were ragihandin. Agahdarkirin beriya her tiştî bo parastina karmendan e. Ev bo wê ye ku nehêle hûn ji diravê rastîn kêmtir dirêv wergirin.

Qanûnên li bara guhertina kantonê (li rûpela X binêrin 7) jî dikarin bişopînin.

**Agahiyên baş li bara kar û çawan peydakirina kar:**  
[www.treffpunkt-arbeit.ch](http://www.treffpunkt-arbeit.ch)

**Agahiyên li bara karmendan:**  
[www.ch.ch/private/00054/00055/index.html?lang=de](http://www.ch.ch/private/00054/00055/index.html?lang=de)

## Tenduristî

B  
F  
F

Dewletî lsviçre zedikî baş ê tenduristiyê pêşkêş dikê. Xwe hişyarkin, çuna hûn û malbeta we dikanin bi tenduristiyek baş bijîn û çi pêşnîhat henê.

Hemû kesên li Swîsê dijîn divê bi neçarî sîgorteya wan a bin-gehîn hebe.

Wekî qadên din ên jiyana rojane, di qada tenduristiyê de jî girîng e ku hûn bikarin agahiyên berhev bikin û heya ku dibe bi zimanê xwecihî pêwendiyê çêbikin.

**Bo pêşilêgirtin û dermankirina nexweşiyên bedenî û derûnî, Daîreya Federal a Tenduristiya Giştî bi zimanên cûrbecûr agahiyên giştalî raber dike:**  
[www.migesplus.ch](http://www.migesplus.ch)

**Heyva Sor a Swîsê (SRD) muqatebûnên bijîşkiyê, derûnî-dermanî û şewirmendiyê bo qurba-niyên şikence û şerr û malbatên wan li Bern, Zûrix, Jênêv û Lozanê pêşkêş dike:**  
[www.redcross.ch/de/organisation/ambulatorium-fuer-folter-und-kriegsopfer/hilfe-fuer-traumatisierte-menschen](http://www.redcross.ch/de/organisation/ambulatorium-fuer-folter-und-kriegsopfer/hilfe-fuer-traumatisierte-menschen)

**Navenda Derûnî-dermanî ya Swîsê (GRAVITA) jî muqatebûnên bijîşkiyê, derûnî-dermanî û şewirmendiyê bo qurbaniyên şikence û şerr û malbatên wan St.Gallen pêşkêş dike:**  
[www.gravita.ch/angebot/](http://www.gravita.ch/angebot/)

## Sîgortên sosyali

B  
F  
F

Li lsviçreşebekak baş û fereh a sîgorta sosyaki heyê. Sûdên her şaxeya ewlehiya civakî ji pêş ve bi rêya arîkariyên derhata bidestxistî tê dayîn. Hûn wekî penaberê pesendkirî, penaberê demane pejirandî û kesê demane pejirandî jî divê wekî swîsiyan arîkariyê bidî û sîdê wergirî.

Xizmetên sîgorteya civakî kesan hemberî metirsiyan, dûhatên malî yê ku ew bi tenê nikarin pêk bînin (wek mînak, eger bêkar be yan seqet be) ewle dikin. Bo kesên ixtiyar jî dirêv didin. Renge eger hevjin bimore yan dayîkbavê (piçûkan) bimore dirêv bidin. Berpîrsê kar karmendan hemberî qeza û nexweşiyên karî sîgorte dike.

Agahiyên zêdetir ser sîgorteya civakî:

[www.bsv.admin.ch/bsv/de/home/sozialversicherungen/ueberblick.html](http://www.bsv.admin.ch/bsv/de/home/sozialversicherungen/ueberblick.html)

Li ser sîgorta bêkarî:

[www.treffpunkt-arbeit.ch/arbeitslos/erste\\_schritte/](http://www.treffpunkt-arbeit.ch/arbeitslos/erste_schritte/)

Li ser sîgortên din:

[www.ch.ch/private/00029/00039/index.html?lang=de](http://www.ch.ch/private/00029/00039/index.html?lang=de)

14

## Baş

B  
F  
F

Penaberên pesendkirî, penaberên demane pejirandî û kesên demane pejirandî divê li Swîsê bacê bidin. Bac li çavkaniyê tê wergirtin, wekî mînak rasterast ji meaşê kesekî beriya ku bidinê (madeyên 83 heya 110 a Peymana Federal ya 14 Dec. 1990 li bara Baca Rasterast a Federal). Bilindbûna bacan dibê werê guherandin ji kantonekî heta kantonekî.



## Alîkariya sosyalî

**B**  
**F**  
**F**

Kesên bacê didin diravê sûdên civakî didin. Qasa sûdên civakî dikare ji kantonekê bo kantoneke din cuda be. Lê li piraniya kantonan, rêzikên hesabkirina arîkariyan, ku Encumena Swîsî ya Saziyên Rifahê (SKOS) diyar dibe, pêk tê. Ev naverokeke baş û kêrhatî ji sûdên civakî li Swîsê piştrast dike.

**B**  
**F**

Penaberên pesendkirî û penaberên demane pejirandî, eger nikarin debara xwe ya malî bikin, bi qasî welatîyên swîsî heqê wan ji sûdên civakî heye.

**F**

Daxwaza kesên demane pejirandî bo sûdên civakî li gorî qanûna lantonê diyar dibe. Bi gelemperî, sûdên civakî bo kesên demane pejirandî li ya penaberên pesendkirî û penaberên demane pejirandî kêmtir e.

**Agahiyên zêdetir li navnîşanên jêrîn:**  
[www.skos.ch/sozialhilfe/haeufig-gestellte-fragen/](http://www.skos.ch/sozialhilfe/haeufig-gestellte-fragen/)

**Hêvî ji hemî kes ên dikarin kar bikin, tête kirin, ku xwe ji alîkariya nivîsgeha civakî bêpar bikin û bi xwe, xwe û malbata xwe bikaribin xudan bikin.**

# Navnîşanê giring

Fermangeha kantonî a penaberiye û kar û îş:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/  
kantonale\\_behoerden/adressen\\_kantone\\_und.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/adressen_kantone_und.html)

Fermangeha kantonî a wetendaşiyê:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/  
kantonale\\_behoerden/kantonale\\_einbuengerungsbehoerden.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/kantonale_einbuengerungsbehoerden.html)

Fermangeha kantonî a nifûsê:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/  
kantonale\\_behoerden/Adressen\\_Meldeverfahren.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/Adressen_Meldeverfahren.html)

Xalên pêwendiyê bo tevlêbûnê li kantona û bajarên:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/  
kantonale\\_behoerden/kantonale\\_ansprechstellen.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/kantonale_ansprechstellen.html)

# Malperê din ê bi fêde

Fermangehên Isviçre online:

[www.ch.ch](http://www.ch.ch)

Fermangehê çapkariyê dewletê ji bo penaberiye SEM:

[www.sem.admin.ch](http://www.sem.admin.ch)

Komisyona sûndarî a ji bo pirsên penaberiye EKM:

[www.ekm.admin.ch](http://www.ekm.admin.ch)

16

## Berpirsiyarî

Derker	Staatssekretariat für Migration SEM Quellenweg 6, CH-3003 Bern Wabern
Nivîsgeha derhênanê	Information und Kommunikation, SEM
Grafik	meierkolb, Luzern
Wênesazî	Fabian Biasio, Luzern
Jêder	BBL, Vertrieb Bundespublikationen CH-3003 Bern <a href="http://www.bundespublikationen.admin.ch">www.bundespublikationen.admin.ch</a>





Ev broşûr bi awaya elektronîk li [www.sem.admin.ch/info-integration](http://www.sem.admin.ch/info-integration) bi van zîmanan heye:

Almanî, Fransî, Îtaliyayî, Inglîzî, Erebî, Tîgrîniyayî, Kurdî, Tîbetî, Farişî, Tamîlî, Somaliyayî û Sêrbî/Krwatî/Bonsniyayî

[www.sem.admin.ch/info-integration](http://www.sem.admin.ch/info-integration)